

Städtepartnerschaft Friedrichshain-Kreuzberg – Dêrik e.V

- Gemeinnütziger Verein -

Bezirksamt Friedrichshain-Kreuzberg * BVV-Büro * Yorckstr. 4-11 * D-10965 Berlin
Mail: info@staepa-derik.org * Web: www.staepa-derik.org * FB: facebook.com/staepafkderik



Daxuyaniya Çapemeniyê

Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê: Tirkîye binesaziya bajarê me yê dost Dêrikê/Al Malikiya bombe dike

Dostaniya bajarên ji bo asîmanên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qedexeya firîna balafirên li dijî Tirkîyeyê daxwaz dike

Komeleya Dostaniya Bajarên a Friedrichshain-Kreuzberg – Dêrikê ruxandina binesaziya debara jiyânî ya sîvîl a li herêman Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (Rojava) ya bi riya balafirên şer û dronên Tirkîyeyê, bi tundî şermezar dike.

Roja pêncşemê, di 05.10.2023an de bi riya êrîşeke hewayî nexweşxaneyêke Covid-19ê ya li bajarê Dêrikê bi giştî hat ruxandin.

Wekî din roja înnê, di 06.10.2023an de santraleke karebayê ya nêzîkî bajêr û santraleke gazê ya herêman, ku 30 km li başûr-rojavayê Dêrikê bû, bi riya êrîşên bi saetan ên balafirên şer û dronên bi gelemperî hatin ruxandin. Zirareke bi qasî çend mîlyon dolar pêk hat. Endezyarê berpirsyar ê santralê, Akid Abdel Majeed da zanîn, ku bi riya 10 êrîşan, turbînên petrolê, santrala desulfurîzasyonê û santrala karebayê hatine ruxandin. Parçeyên turbînan ên tamîrê li Sûriyeyê tune ne û mirov dikare van parçeyan encax li bazara navneteweyî bi dest bixe.

Tekane santrala enerjîyê ya li bakur-rojhilatê Sûriyeyê, ku hêj çalak bû, çavkaniya gaz û karebayê ji bo tevahiya gerêmanê. Di heman demê li wê derê tûpên gazê yê malan dihatin dagirtin. Hêj di Mijdara 2022an de ev santrala enerjîya ji ber êrîşên hewayî yê Tirkîyeyê zirarên mezin dîtibû.

Medyayên cuda yê herêmanê wekî din radigihînin, ku zêdetirî 29 gund û bajar, 5 santralên karebayê, 7 santralên petrolê, 2 stasyonên ava vexwarinê, santraleke gazê û her wisa bendava Cil Axayê hatine bombekirin. Hete niha tê zanîn, ku 12 kesên jiyana xwe ji dest daye. Di dema weşandina van agahiyan de hêj êrîşên hewayî yê Tirkîyeyê berdewam bûn.

Piştî ku wezîrê karê derve yê Tirkîyeyê Hakan Fidan piştî êrîşa fedayî ya li Wezareta Karên Hundir a li Enqereyê, ji bo xwe tevahiya binesaziya bakur-rojhilatê Sûriyeyê wekî armancên êrîşan ên rewa ragihand, gelek herêman û deverên bakur-rojhilatê Sûriyeyê bê kareba, av û gaz hatin hiştin. Bêyî delîlan, hikûmeta Tirkîyeyê îdîa dike, ku kiryarên bûyerê ji aliyê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hatine perwerdekirin û şandin. Bi vê yekê re ew ji bo êrîşên xwe yê li armancên leşkerî û sîvîl ên li bakurê Sûriyeyê bingehekê ava dikin û vê yekê wekî mafê xweparastinê nîşan didin.

Desteya rêveber a komeleya dostaniya bajarên dide xuyakirin, ku „êrîşên bi zanetî yê li dijî armancên xwerû sîvîl, sûcên şer in, û ferq nake, ku ev yek li bakurê Sûriyeyê, li Ukranyayê yan jî li cihê din pêk werin.“ Ruxandina hedefên sîvîl her wisa wekî mafê xweparastinê di Artîkel 51 ya Peymana Neteweyên Yekbûyî de jî cî nagire. Bi van êrîşan mafên gelan tînin binpêkirin.

Divê ji bo kesî diyar be, ku mirovên li bakurê Sûriyeyê nikarin bê av, kareba û gaz bijîn. Em bi fikar in, hejmara kesên penaberên li Ewropayê zêdetir bibe. Gava binegeha jiyân û debara mirovên li bakurê Sûriyeyê were ruxandin, hingê bi mîlyonan mirov berê xwe bidin ku derê? Ew ne dikarin û ne jî dixwazin herin Tirkîyeyê yan jî herêmanê rejîma Sûriyeyê. Riya pêşberî wan dimîne ew e, ku ew li ser Êraqê re berê

Bankverbindung: Städtepartnerschaft Friedrichshain-Kreuzberg – Dêrik e.V * GLS Bank * IBAN: DE54 4306 0967 1225 6804 00
BIC: GENODEM1GLS

Steuer-Nr. 27 / 677 / 68301

xwe bidin derveyî welêt. Diviya armanca me tevan ew bûya, ku em sedemên penaberiye rakin û sedemên nû pêk neynin.

Em ji bo asîmanên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê qedexeya firîna balafiran li dijî Tirkiyeyê daxwaz dikin!

Berlin Friedrichshain-Kreuzberg, 09.10.2023